Çîrok

DiVÊ EZ HERiM

Mîrhac Mistefa .....

Jiyana min li vî bajarî dawî bû. Êdî divê ez herim; cihên dûr, welatên biyaniyê, warên xerîb û xûrbetê û bibim penaberek li ser rûyê erdê. Evîna min! êdî ez nikarim wekî te dergehên vî bajarî vekim, kolan û kûçeyan de bigerim, silav bikim, hembêz bikim û lê xwedî derkevim. Êdî ezê nikaribim wekî te li Girê Keçikan, êvaran bi vexwarina çayê re, temaşeya daketina rojê û tîrêjên wê yên bi nalîn bikim. Ezê nikaribim destê te bigirim, germahiya te êdî dilê min wê neferkîne û mist nede. Ronahî û birûskên çavên te êdî dilê minê tarî ronî nake. Peyvên te birînên rûhê min derman nake. Ji xwe te gotibû "Li vî bajarî evîn qedexeye!" û vî bajarî tû car dawî li evînên xwe ne aniye, her tim jiyan li vî bajarî nîvrê hiştine û jiyana evîna me jî wê nîvrê bimîne. Lê em bûn dîlê dilê xwe. Tiştek ji destê me nedihat. Bi tenê biryaran me di anî cîh. Dîsa biryar hatiye sitandin û divê ez herim, erê ji hev veqetînê re hindik ma. Ewr li ser dilê me wê bigere û birûsk wê dakevin li nîvê kezebê dû sê dilop hêstir wê ji çavên me werin xwar. Ezê bixwazim te himbêz bikim û bigirîm, lê ji sînorê kevneşopiya ezê nikaribim derbas bibim. Bi tenê dilê xwe de ezê bêjim bi xatirê te û tê bi çavên xwe, ji min re bêjî oxirbe û dilêxwe da tê bêjî evîna min, yara min neçe neçe neçe...

Evîna min; "Qey her kes kerr bûye ku kes qîrîna vî bajarî nabihîse! Qey her kes kor bûye ku hêstirên vî bajarî nabînin! Qey her kes bê dil maye ku kes jana vî bajarî hîs nake! Gelo kîjan welat ji kerba mirovên xwe dîn û har bûye. Kîjan welatî serpêhatî û çîrokên xwe ew qas bi ser hevdu re tîr kirine. Kîjan welat li zimanê xwe

geriyaye...” ev bajarê xwedî sê erd, sê çem û sê ziman. Ev bajarê kevnare û qedîm. Bi dewlemendiya xwe ve reng daye şaristaniyên Mezrabohta. Ê pêşî ne ezim ku terka vî bajarî dikim û ne jî yê dawî. Ev bûn çend sirgûn ku vî bajarî di dilê xwe yê tijî de jiya! Ev bûn çend sirgûn ku xwîna vî bajarî mêt! Ew sirgûnên berî noht salan, Ew sirgûnên gelan, gelên Ermenî, Aşûrî, Kildanî û Sûryaniyan. Ew sirgûnên ku li dewsa şahî û hembêzkirinê; girî, veqetandin û mirin hiştibûn li pey xwe... êdî li vî bajarî hemû kes li hêviya sirgûn kirina xwe ye. Bajar birêkirina zarokên xwe westiya! Çemê Bohtan bi xûm xûma xwe raperînê dike, Tehta Mendik qelişî, germava Bilorîs sar bû. Seyrangeha Serê Zînî şewitî, Qesrên cas hildiweşin, Kolanên bajar diqîrîn, Kûçe dinalin bi qîrîn û hawar...! Hey hawar hawaaar ev bajar, bajarê miriyane! Bajarê miriyane! Ma tû nabihîsî evînamin deng nayê te?

Îro jî ev bajar zarokên xwe bi rêdike, alî tarîtiya mirinê û tûnebûnê ve dişîne. Li kolan û kûçeyan de zarokên tînêrkêşji serma xwe li hev dipêçin, germahiya hevaltiyê digerin, selpakfiroşên bê hêvî, li benda debara xwe ne. Ji rûyê boyaxkarên pêlavan evîn dirije. Li nexweşxanan de melayikên biçûk dimirin... ma tû nabînî? erê evînamin divê ez herim bajarekî, kanî digotin “jan mirovan dikemilîne” lê ezê janên xwe bavêjim. Ji bîr bikim hemû keseran. Tirs dibe sî dikeve pey min, keser dibe birîn, dikeve canê min, hesret ji xwe bûye Pêlûxeke agir û ketiye dilêmin. Bêje evîna min ez neçim, ezê çi bikim...?.....